

KURDWATCH●Nivîsar 5

Kurdên bê nasname li Sûriyê

Koçberên neqanûnî yan goriyên
siyaseteke neteweperest?



KurdWatch projeyeke

Navenda Ewropî ji bo Lêkolînên Kurdî ye

Europäisches Zentrum für Kurdische Studien

Emser Straße 26

12051 Berlin

Elmanya

Telefon: +49 – 30 – 62 60 70 32

Faks: +49 – 721 – 1 51 30 34 61

info@kurdwatch.org

© KurdWatch, adara 2010ê

Kurdên bê nasname li Sûriyê

Koçberên neqanûnî yan goriyên siyaseteke neteweperest?

Di 23ê tebaxa 1962ê de hikûmeta Sûriyê bi mersûmê jimar 93 biryara serjimartineke awarte ji bo parêzgeha Hisiçayê da, ku di 5ê cotmeha 1962ê de pêk hat. Di encama wê de 120 000 Kurd nasnameya sûrî winda kir û bi wê re mafên bingehîn ên welatiyan jî windabûn. Ji ber ku herweha zarok û zarokên zarokên kesên bê nasname yên qeydkirî (*ecnebî*, bi kurdî »biyanî«) li wan tê kirin, bê nasname ne, di pêncî salên dawî de hejmara kesên *ecnebî* berdewam zêde bû.

Ta roja îroj tevlihevî di şiroveya siyasî ya stendina nasnameyan ji Kurdan de heye. Gelo ew tenê tedbîrine teknîkî yan tenzîmî bûn, wek ku hikûmeta sûrî ta roja îroj îdîa dike? Yan jî dive serjimartina di sala 1962ê de di çarçeweya tedbîrên erebîkirinê yên din bê fêmkirin – mirov dikare bi taybetî behsa »Plana ji 12 xalan« a Mihemed Teleb Hîlal di sala 1966ê de yan sazkirina »kembereke erebî« seranserî sînorê sûrî-tirkî yan sûrî-iraqî di navbera 1973 û 1976ê de bike? Kê bi Serjimartina Awarte dida dû kîjan armancên siyasî? Kê sûd jê digirt? Da ku mirov bersiva van pirsan bide, pêşî wê hewildana peydakirina ciyekî dîrokî ji stendina nasnameyan ji Kurdan re bê kirin. Di vê çarçeweyê de wê beşên giring ên mersûmê eslî bîn şirovekirin û wê rewşa pêkanîna Serjimartina Awarte jî xalek be ku wê bête behskirin.

Ji aliyekî din ve wê astengên ku Kurdên *ecnebî* di roja îroj de rastî wan tînin, bîn şirovekirin – bi taybetî di warê karûbarên bîrokratîk de (wek mînak qeydkirina zewacan). Li vir wê herweha rewşa jiyana komeke duyem a kesan, ku ji wan re *mektûm* (biyaniyên ne-

qeydkirî) tê gotin, û peywendiya wan bi serjimartina di sala 1962ê de bê guftûgokirin.

Di gaveke siyem û dawî de wê pirs bê kirin, bê çawa kêşeya Kurdên bê nasname di hema bêje deh salên dawî de, ji dema ku Beşar el-Esed bûye serok, di çarçeweya siyaseta hundir û derve ya Sûriyê de hatiye guftûgokirin.

Awireke dîrokî

Biryara pêkanîna serjimartineke awarte li parêzgeha Hisiçayê di dema intîqalî de di navbera dawîya yekîtiya Misrê bi Sûriyê re ji bo Komara Erebi ya Yekbûyî de di 28ê îlona 1961ê de û yekemîn hewildana rûxandina rêjîmê ji aliyê Partiya Bees ve di 8ê adara 1963ê de pêk tê.

Di dema Komara Erebi ya Yekbûyî de ji aliyekî ve li Sûriyê dezgehên siyasî bi şeweyekî giran hatibûn têk-birin,¹ ji aliyekî din ve dest bi reformên civakî-aborî yê berfireh hat kirin. Di sala 1958ê de biryara qanûneke li ser peywendiyên çandiniyê û herweha Qanûna Reformên Zeviyên hat stendin. A pêşî ji bo cara pêşî peywendiyên di navbera xwediyên zeviyên, kirêdar û karkeran saz dikir – wê dema kar a di heftiyê de bi sînor kir, dixwest sînorên binî yê mûçeyan destnîşan bike, meseleya kirêdayinê yê heta-hetayê qedexe kir û rêyek ji bo parkirina mûsim di navbera xwediyên zeviyên û kirêdaran de peyda kir. Qanûna Reformên Zeviyên sînorên jor ji bo milkiyeta zeviyên destnîşan kirin (120 hektar zeviyê avî yan 460 hektar zeviyê ne avî) û ferz kir ku milkê ku sînoran derbas dike, gerek bibe milkê dewletê û bê belavkirin. Bi tevayî dora 1,3 milyon hektar ji bo parkirinê gihan hev – ku erê dewletê ta 1961ê dora nêvî ji xwe re bir, lêbelê tenê 60 000 hektar li ser 4 500 malbatên cotkaran belav dikir.² Qanûna Kar a ku di nîsana 1959ê de biryara wê hat stendin, çalakiyên siyasî ji sendîqayan re û herweha grav qedexe kirin, lê Qanûna Temîna Civakî bû destpêka temînatên ji bo mirin, seqetbûn, belaya kar û taqaudê. Şaxên bazara sûrî-misrî berfireh bûn, alavên dewletê ji bo piştewaniya şirketên prîvat hatin berfirehkirin, ku bi taybetî burciwaziya sûrî sûd jê digirt. Ji ber piştgiriya pir kêma beşê prîvat ji bo planên pêşdebirinê yê dewletê, reva sermiyan ji bo derve û herweha ji ber armancine siyasî-desthilatdarî di tîrmeha 1961ê de dewletê destên xwe

1 Tevaya partiyên sûrî hatin qedexekirin, artêşa sûrî hat xistin bin biryara misrî, bîrokratiya misrî û sîstema polîsan a misrî ket şûna ya sûrî.

2 Perthes 1990: 55.

danîn ser bank, temînat û şirketên industriyê yê mezin – ku ev tedbîr bûn ciyê nerazîbûna zibûnên birciwazî. Destdanîna dewletê li ser zevîyan ên behskirî wek sedemeke bingeîn ji bo inqîlaba »tevgera cûdaxwaz« di 18ê îlona 1961ê de tê dîtin, ku ji aliyê komek ji zabitên muhafîz ve hat pêkanîn. Serxwebûna Sûriyê bi inqîlabekê dîsa hat vegeandin û karûbarên medenî yê hikûmetê radestî hikûmeteke intîqalî ji nav baskê rastgir ê tebeqeya birciwazî hat kirin.

Di sal û nîva bi dû de bi tevayî pênc hikûmetên temenkin bi dû hev hatin. Ji ber inqîlab û hewildanên inqîlabê yê cuda û herweha ji ber destdirêjiya artêşê di prosesên biryarê yê siyasî û sazkirina hikûmetê de desthilata wan sînorkirî bû. Armanca »tevgera cûdaxwaz« ew bû ku rewşa berî damezirandina Komara Erebi ya Yekbûyî dîsa vegeandin, bi taybetî têkbirina milîkirina zevîyan û reformên zevîyan. Bi rastî jî biryarên ku di navbera îlona 1961ê û adara 1963ê de dihatin stendin, gelek caran nelihêv bûn. Wek mînak sîrorên milkên Qanûna Reformên Zevîyan pêşî bi şeweyekî berbiçav hatin daxistin û milîkirina şirketên pîşesaziyê li paş hat vegeandin. Lê piştî demeke kurt guhertinên di Qanûna Reformên Zevîyan de dîsa bi paş de hatin vegeandin û mezintirîn şirketên ku milkiyeta wan bûbû şexsî, dîsa bûn milkên dewletê. Milîkirina bankên sûrî bi şûnde hatin kişandin, lê bankên neerebî man milkên dewletê û ji xebata bankên sûrî yê erebî re hin merc hatin danîn.

Biryardayina mersûmê jimar 93 di 23ê tebaxa 1962ê de ji aliyê serokê Sûriyê el-Qudsî ve di hefteyên dawî de ji dema desthilata serokwezîr Beşîr el-Ezma pêk hat. Encûmena Wezîran beriya wê bi rojekê biryara mersûmî dabû – ku yek ji biryarên dawî bû ya hikûmeteke çels û nebikêrhatî, ku demeke kurt piştê ji kar vekîşiya: Piştî Beşîr el-Ezma di 17ê îlona 1962ê de Xalid el-Ezim hat, ku di dema hikûmeta wî de mersûmê jimar 93 di 5ê cotmeha 1962ê de hat pêkanîn. Hêza livdar li pişt biryara serjimartinê parêzgerê parêzgeha Hîşîçayê Seîd es-Seyid bû. Es-Seyid ji mêj ve dext li ser hikûmetê pêk dianî, ku serjimartinekê li Hîşîçayê pêk bîne – û dawî jî bi ser ket. Ew di bîranînên xwe de xwe wek »neteweprestekî ereb ê ekstremîst« bi nav dike, ku armanca wî ya jiyane »yekîtiya erebî« ye.³ Hiceta wî ji stendina nasnameyan ji Kurdan piştî serjimartinê ew

bû ku »koçberkirina neqanûnî ya Kurdan ji bo Sûriyê muamereyek e bi armanca bicîkirina hin grûpên milletên neerebî di sêqorziya petrolê ya sûrî de«. Têgeha »sêqorziya petrolê« vedigere sala 1962ê dema şirketên petrolê yê ne zêde mezin ên ewropî û emerîkî li ser derxistina petrola nûdîtî li parêzgeha Hisiçayê hevrikî dikir. Es-Seyid berdewam diyar kir, ku »koçberiya Kurdên tirk ji bo Sûriyê metirsiyeke mezin ji bo ewlekariya Sûriyê ya erebî pêk tîne«. Wî got:

»Parkirina zeviyan ne hema wilo pêk tê li ser her timaekî, lêbelê li gor pîvanine zelal û destnîşankirî. Tenê welatîyên dewletê sûdê jê digirin. Lê ti nesîbê mirovê biyanî di zeviyên parkirî de tune.«⁴

Hikûmeta el-Ezim peyvên wilo bi kar dianîn dema wê hewil dida ku nerîna raya giştî tevlihev bike, bi vî awayî ku wê kesên ku ji qanûna li ser reforma çandiniyê sûd digirt mîna »koçberên« gumanbar pîs dikir, ku mîna dizan derbas bûne, da ku zeviyan bi dest bixin, ku ev tişt »ewlekarî«, »nasnameya erebî« û »serxwebûna« Sûriyê dixwe metirsiyê.⁵

Wilo dixuye ku es-Seyid ji bo projeya xwe hevalbendên din peyda kiribe: milkdarên mezin ên nişteciyên parêzgeha Hisiçayê. Ji bo vê grûpa ku xwedî bandoreke siyasî ya berbiçav bû, serjimartin û bi dû de stendina nasnameyan ji Kurdan derfetek bû ku ji destdanîna ser zeviyên wan, di çarçeweya reforma zeviyan de, bifilitin an jî zeviyên xwe bi şûnde vegeerînin. Eger cotkarên kurd wek »koçber« dihatin biçûkkirin û ji ber vê yekê ne ji mafê wan bû ku ji parkirina zeviyan sûdê bigirin, hingî milkdarên mezin dikarin sûdê ji vê yekê bigirin. Ne zelal e bê ta çi radeyê milkdarên kurd û yê din jî hewil da ku ji stendina nasnameyan ji Kurdan sûdê bigirin an jî bi rastî jî sûd girt. Barût di nivîsara xwe de behsa meseleya milkdarê mezin ê kurd, parlamenter û wezîr Ebdilbaqî Nîzamedîn dike, ku wî ji bo demekê karîbû zeviyê xwe ji nav destên cotkarên gelaciya wan hatibû kirin ku xwedê giravî ew »koçber« bûn, bi şûnde vegeerîne. Lê dawiya dawî ne tenê zeviyên wî dîsa jê hatin stendin, lê herweha ji beşekî ji malbata wî nasnameya sûrî hat stendin bi sedema ku ew »biyanîyên tirk« bûn.⁶

Ku di serjimartinê de mesele ne tenê meseleya serastkirina qeydan bû, deqa qanûnê bi xwe jî eşkere

4 Barût 2009. Barût xwe dispêre nivîsareke di rojnâmeya *el-Eyam* de, 6ê çiriya paşîna 1962ê.

5 Barût 2009. Barût xwe dispêre axavtineke bi Ehmed Ebdilkerîm re, ku di encûmena wezîran a Beşîr el-Ezmê de Wezîrê Reforma Çandiniyê bû, di 15ê tîrmeha 2009ê de.

6 Barût 2009.

dike.⁷ Di bendê 1ê yê mersûmê li vir behskirî de hatiye nivîsandin:

»Dive li parêzgeha Hisiçayê di rojekê de serjimartineke giştî pêk bê.«

Bendê 19ê, beşê a, destnîşan dike bê mirov çawa dikare belgeyên nasnameya sûrî di çarçeweya vê serjimartinê de pêşkêş bike. Pêşî dive belgeyên taybetî bên pêşkêşkirin:

»Ji her welatîyekî Komara Erebi ya Sûrî, yê ku di qeydên rewşên medenî de li parêzgeha Hisiçayê qeydkirî be, tê xwestin ku di dema biryara wezîrê hundir destnîşan dike de nisxeyekê ji qeyda xwe û ya malbata xwe ji qeydên medenî derxîne, da ku roja serjimartinê ji karmendên dewletê yê serjimartinê re bên nîşandan. Deftera malbatê û nasnameya şexsî dikarin li şûna nisxeya qeydê bên bikaranîn.«

Kesê ku van belgeyan pêşkêş neke, xwe li gor bendê 23ê, beşê c, gunehkar dike:

»Eger di qanûnên din de ti cezayeke girantir peyda nebe, her kesê ku li pêşiya komîteyên serjimartinê yan dezgehên berpirsyar bi mebesta teqezkirin an inkarkirina nasnameya erebi ya sûrî ji bo xwe yan jî xeynî xwe agahiyên çewt dabe yan bi zanebûn belgeyên çewt pêşkêşî wan kiribin, bi cezaya zindanê ji şeş meh ta du salan û bi cezayeke diravî ji pêncsed ta du hezar lîreyên sûrî yan jî yek ji van herdu cezayan tê cezakirin.«

Herweha dive qaxetên serjimartinê bên dagirtin. Agahiyên di van qaxetan de ji aliyê komîteyên qeydkirinê ve tîn fehskirin. Di bendê 10ê de hatiye nivîsandin:

»Berî qeydkirina nişteciyan di qeydên medenî de komîteyên qeydkirinê bi hemî rêyan û bi hemî şeweyan rastiya agahiyên di belgeyên serjimartinê de, yê ji aliyê xwediyên meseleyê ve qeydkirî, lêkolînê dike, bi taybetî gerek e ew van agahiyên bidin ber agahiyên di kevneqeydên rewşên medenî yê bingehîn de û encamê pêşkêşî Komîteya Navendî bikin, da ku biryara qeydkirinê yan jî neqeydkirinê bide.

Eger ji encamên lêkolînê ji komîteyên qeydkirinê re êşkere bû ku hin agahî di belgeyên serjimartinê de

7 Tevaya deqa orijînal a qanûnê û herweha wergera wê dikare di malpera <www.kurdwatch.org> de di rûpela »Belge« de bê xwendin.

kêm in an jî ne wek rastiyê ne, gerek e ew wan ji ber xwe ve yan jî li ser daxwaza xwediyên meseleyê temam bike yan bi biryareke xwe wê serast bike.«

Biryara dawî, bê ma kesek di qeydên medenî de bê qeydkirin an na, ne di destê komîteyên qeydkirinê de ye ne jî di yê Komîteya Navendî de, lêbelê di destê Komîteya Bilind (bendê 7ê) ye. Ev komîte biryara dawî dide bê ma gilî qanûnî ne yan na. Di bendê 14ê de hatiye nivîsandin:

»Xwediyên meseleyê dikarin di maweya sê mehan de, ya ji roja weşandina biryara bidawîanîna serjimartinê dest pê dike, doza qeydkirina tiştên bi wan ve girêdayî ji rastiyên jibîrkirî yan serastkirina şaşitiyên bi wan ve girêdayî bikin, yên ku di serjimartinê yan qeydkirinê de pêk hatine. Ev doz dive bi nameyeke nivîskî ji serokê Komîteya Navendî re li parêzgehê bê rêkirin. Piştî pêkanîna lêkolînan, komîte biryara xwe di meseleyê de distîne. Nabe ku xwediyên dozê bî cizakirin an cezaya diravî ji wan bê xwestin. Mirov dikare li pêşiya Komîteya Bilind li dijî vê biryarê gilî bike.«

Piştî ku ev dem bi dawî bibe, qeydkirinên di qeydên medenî de yan jî serastkirina qeydên berê pêkhatî tenê bi biryara dadgehên peywendîdar (bendê 16ê) gengaz in. Herweha ji bo meseleya ku kesek di roja serjimartinê de li derveyî parêzgeha Hîsiçayê yan li derveyî welêt be, tedbîr hatine stendin: Li gor bendê 20ê ji

»her welatiyekî Komara Erebî ya Sûrî, ku di qeydên rewşên medenî yên niha de li parêzgeha Hîsiçayê qeydkirî be yan *mektûm* be û eslê wî ji parêzgeha binavkirî be, û di roja serjimartinê de li derveyî parêzgehê bû, [...] tê xwestin ku di maweya panzdeh rojan de ji roja serjimartinê ve serî li mûdîrê nifûsa ku ew lê dimîne, bide, da ku belgeya girêdayî bi qeydkirina xwe û endamên malbata xwe dagire. [...]

Eger ev kes li derveyî welêt be, jê tê xwestin ku serî li konsulê Komara Erebî ya Sûrî li dewleta ku ew lê nişteci ye bide, da ku di maweya sê mehan de ji roja serjimartinê belgeya destnîşankirî dagire.«

Kesên ku di encama serjimartinê de di qeydên welatiyên sûrî yên ereb de hatin qeydkirin, qeydeke *biyanîyên* qeydkirî bi dest dixê.

Tiştê balkêş li vir dema gelekî kurt e – rojek – ku di vabû serjimartinê de pêk hatiba, û herweha dema kurt ji bo gilîkirina li dijî encamên serjimartinê – sê meh – an jî demên kurt ji bo wan kesên ku di dema serjimartinê de ne li parêzgehê bûn, da ku piştê xwe û malbatên xwe qeyd bikin. Ev yek dive bi vî awayê berbiçav bê behskirin, çimkî welatîyên li Hîsiçayê bêtir gundî bûn, ku ne dizanîbûn bixwînin ne jî binivîsînin û ku çûna wan cem dezgehên dewletê pir kêr bû. Ku mirov rast be, mirov nikarîbû ji vî grûpa kesan hêvî bike ku di demên destnîşankirî de tevbigerin.

Heman tişt ji bo wê xalê de gotin, ku mirov mecbûr e qeydeke şexsî yan malbatî wek belgeya nasnameyê pêşkêş bike, yan jî nasnameyê şexsî û deftereke malbatê, eger di dema pêwîst de qeyda şexsî yan malbatî nehatibin xwestin. Rastiyek e ku di salên 1960î de gelek malbatên cotkar ên kurd an jî ereb di ti qeydan de neqeydkirî bûn, ne giring bû bê ew kînga hatibûn Sûriyê. Qeydeke wilo ne qaîde bû ji bo herkesî. Mersûmek ku di demên kurt ên ne realîst de doza belgeyan dikir, ku gelek malbatan nikarîbû pêşkêş bikin, ji ber ku li cem wan tunebûn – ku hayê berpirsyanan baş jê hebû – ne xwedîya wê armancê bû ku serastkirina qeydên medenî pêk bîne.

Di vî çarçeweyê de herweha pirsek derdikeve holê, bê bi çî awayî welatî li ser serjimartinê û demên ku gerek bû derbas nebin, dihatin agahdarkirin. Di rojnemeyên wê serdemê de mirov hema bêje ti agahiyan li ser serjimartinê peyda nake⁸ – ji xwe em behsa wê yekê nakin ku alavên ragihandinê yên çapkirî ne zêde rêyek baş bû ji bo ku mirov xwe bigihîne xelkê.

Di dema pêkanîna serjimartinê de gelek bînpêkirin pêk hatin, ku ji aliyekî ve sûcê dema destnîşankirî ya kurt bû, lê ji aliyekî din ve ji kêşeya demê wîrdetir bûn. Li gor raportên çavdêran karmendên dewletê ku serjimartinê pêk dianîn, gelek caran nedîçûn cem cem welatîyan bi xwe, lê ew tenê diçûn cem muxtaran, da ku muxtar ji wan re bêjin bê kî bi eslê xwe ji Sûriyê bû û kî ji dewletên cîran koçber bûbû. Çarenivîsa welatîyan ketibû nav destên muxtaran, ku ji nişkê ve bûbûn xwedî desthilateke berbiçav. Ne dîr e ku wan dida dû berjewendiyên xwe yan jî hesabên berê safî dikirin⁹ – bi kêmanî eger hayê wan ji giringiya serjimartinê hebû.

8 Tenê çend nivîsarên kurt di rojnemeyên *el-Nesir*, *el-Wihda* *el-Erebiya* û *el-Eyam* de peyda dibin. Ev nivîsaran behsa hin beşên mersûm an gera ji bo alîkarî ji bo pêkanîna mersûm an jî bidawîanîna serjimartinê dikin. Me nekarî nivîsarekê jî peyda bikin, ku tê de li cîyekî xuyayî – wek di rûpela pêşî de – behsa pêkanîna serjimartinê dikir an ji xelkê dixwest ku beşdarî wê bibin.

9 Biner li Human Rights Watch 1996: 14.

Ev yek li ser milkdarên mezin ên herêmê jî pêk tê. Ne dût e ku li wan jî, mîna li muxtaran, wek çavkanî ji bo eslê gundiyan dihat nerîn, ku ji wan re derfetek çêdikir, bêbextiyan li wan kesan bikin, ên ku di zeviyên wan ên berê de dixebitîn, û wan mîna koçber bidin naskirin. Çavkaniyeke çewtiyê a din karmendên qeydên medenî bi xwe bûn. Di nivîsareke rojnameya erebî *Saut el-Ereb* de nivîskar dinivîsîne:

»Hevalê min bi çavên xwe di yek ji dezgehên qeydên sîvîl de tiştêk dît: Kurdek tê û deftera wî ya malbatê di destên wî de ye, lê dîsa jî karmendê dewletê jê re dibêje: »Ti qeydên te li cem min tunene«¹⁰

Ji bilî sersarî û dema hindik, mirov dikare di rêya agahiyên çewt ên bi mebest ên wilo re jî baş şirove bike bê çima di hin malbatan de biraderek ma welatîyê sûrî, lê ji birayekî din nasname hat stendin, an jî dê û bav dikarîbûn bimînîn welatîyên sûrî, lê zarokên wan nasnameyên xwe winda kirin.

Hikûmetên Sûriyê yên ku ji sala 1962ê bûne desthilatdar, dan dût stratejiyên cuda eger dibû pirsê peyda kirina behaneyan ji serjimartina 1962ê re. Ji aliyekî ve şiroveyên hikûmeta el-Ezim, ku Kurdên ku nasname ji wan hat stendin, koçber bûn, dihatin berdewamkirin. Hîn di tîrmeha 1996ê de dihat gotin:

»Di destpêka sala 1945ê de Kurdan dest pê kir ku bi dizî têkevin parêzgeha Hisiçayê. Ew yeko-yeko yan jî di grûpan de ji dewletên cîran dihatin, bi taybetî ji Tirkîyê, û bi qaçaxî sînore di navbera Serê Kaniyê û Dêrikê de derbas dikir. Ew hêdî hêdî û bi awayekî neqanûnî li seranserî sînora di navendên welatîyan ên mezin mîna Dirbêsi, Amûdê, Qamişlo, Tirbesipî û Dêrikê bi cî bûn, ta ku wan li hin ji nav navendan, mîna li Amûdê û Dêrikê, dest pê kir ku piraniyê pêk bînin. Gelek ji van Kurdan di wê rewşê de bûn ku bihêlin ew bi şeweyekî neqanûnî di qeydên medenî de bînin qeyd kirin. Ew herweha di wê rewşê de bûn ku bi alîkariya mirov û endamên eşîrên xwe di rêne cuda re nasnameyên sûrî bi dest bixin. Wan ev yek bi wê armancê dikir, ku nişteci bibin û milk bi dest bixin, bi taybetî piştî weşandina qanûna li ser reforma zeviyên, da ku ji şûndeparkirina zeviyên sûdê bigirin.«¹¹

10 Sarûx, »Kaifa tadehmu al-aħbâr!«, *Saut el-Ereb*, 16ê çiriya paşîna 1962ê.

11 Human Rights Watch 1996: Appendix A.

Bilindbûna ecêb a hejmara welatiyan li parêzgeha Hisiçayê di navbera salên 1954 û 1961ê de wek belge ji bo teyoriya »derbasbûna bi dizî« hat pêşkêşkirin: Li gor statîstîkên fermî hejmara welatiyan di vê demê de ji 240 000 bû 305 000, ango bîst û heft ji sedî zêdetir bû. Li gor mestereyeke hikûmeta Sûriyê di hizêrana 1962ê de xwedêgiravî hejmara welatiyan 340 000 bû.¹²

Ev şirove van pirsan derdixe holê. Ji aliyekî ve di dema serjimartinê bi xwe de guman li ser gengazbûna hebûna koçberiyê girseyî ya Kurdên ji Tirkiyê ber bi Sûriyê ve hebû. Di nivîsara rojnameya *Saut el-Ereb* de nivîskar behsa vê xalê dike. Ew behsa hevdîtineke bi hevalemî kevn re dike, ku li Cezîrê wek cotkar kar dike.

»Piştî hembêzkirinê min jê re got: »Ha koçber!« Ew kenîya û bersiv da: »Qey te ji qerebalix mezî li ser koçberên ku ji Tirkiyê hatine Cezîrê bawer kir?« [...] Hevalê min Ereb kurê Erebeke me. [...] û ez jî Ereb kurê Erebeke me. [...] Ez naxwazim Kurdan biparêzim. [Lê] eger ez li dîroka wan a kevn û nû bigerim, ez ji dema Eyûbiyan ve ti helwesteke wan li dijî erebbûnê nabînim ...

Hevalê min ji min re behsa hin tiştan kir, û ez li vê derê bi wê hêviyê behs dikim, ku hikûmet wê bixwîne: Ne rast e, ku bi hezaran kes ji Tirkiyê hatine Cezîrê.«¹³

Ji aliyekî din ve ji pêşî de tê îdîakirin ku tenê Kurd ji Tirkî û Iraqê ji bo jiyaneke xweştir hatin parêzgeha Hisiçayê. Rastiya ku li wir, û bi taybetî li herêma ku navê Cezîreyê Bilind lê tê kirin, parkirina zeviyê mîwedar li ber pêkanîne bû, hişt ku ji bilî Kurdên ji Tirkî¹⁴ û Iraqê herweha Filehên ji Tirkiyê (wek mînak ji Tur Ebdîn), Ereb û Kurdên di parêzgehên sûrî yên din û herweha Ereben ji Iraq û Tirkiyê¹⁵ bîn wir. Bilindbûna hejmara welatiyan di vê demê de teqez vedigere hatina komên ji nav van grûpên kesan ên jorîn. Lê di sala 1962ê de – ku mirov behsa mînakên tekane neke – nasname tenê ji Kurdan hat stendin.

Ji aliyê siyem ve rastiyeke din li dijî wê îdîayê ye, ku Kurdên ku nasname ji wan hat stendin, ji Tirkî yan Iraqê ne, çimkî ji sala 1962ê ve ti hikûmeta sûrî hewildaneke cidî pêk neaniye, da van kesan vegeerînin wan welatan.

Dawî eşkere dibe ku dozek jî naskirî tune, ku karmendekî dewletê di dezgeha nifûsê de ji bo qeydkiri-

12 McDowall 1998: 22.

13 Sarûx, »Kaifa tadehmu al-aħbâr!«, *Saut el-Ereb*, 16ê çiriya paşîna 1962ê.

14 Bikaranîna makîneyan di çandiniyê de li Tirkiyê ji sala 1950î û pê ve bû sedema bêkariyê mezî û koçberiyê xurt ji bo kar. Biner li McDowall 1996: 401–402.

15 Li herêma derûdora Mêrdînê hejmareke ne xerab ji Ereban dijî.

na neqanûnî ya Kurdên ji Tirkiyê yan Iraqê berpirsyar hatibe dîtin. Lê eger, wek ku ji aliyê hikûmeta Sûriyê ve îdîa tê kirin, beşek mezin ji kesên ku nasname ji wan hat stendin, di rêyeke nerewa re wek welatîyên xwedî nasname hatibe qeydkirin û ne neqeydkirî bû,¹⁶ hingî ew qeydkirinên neqanûnî fênomêneke girseyî bû, ku bêyî alîkariya sîstematîk a karmendên di dezgeha nifûsê de ne gengaz bû. Lê çima ew nehatin mecbûrkirin ku berpirsariyê hilgirin ser xwe?

Xeteke duyem ji bo şiroveyên hikûmeta sûrî ew bû ku li xwe mûkir were ku di çarçeweya serjimartinê de şaşitî (yên teknîkî) pêk hatine. Li gor wê bêhemd nasname ji hin kesan hatiye stendin, hinên din jî dikarîbûn wê bi awayekî neqanûnî bi xwe re bihêlin. Hikûmet diyar dike ku ji ber vê yekê derfet hebû, ku piştî jî belgeyên pêwîst bînin pêşkêşkirin, da ku hebûna li ser xaka dewletê berî 1945ê bê teqezkirin û nasnameya sûrî dîsa bê bidestxistin. Ji bilî qeydên ji qeydên medenî berî 1945ê, qeydên ola mesîhî û yên kêmeteweya aşûrî, herweha belgeyên ku isbat dikir ku kesek di dehsalên berî serjimartinê de karmendek dewletê yan artêşê bû yan jî qaxezên bacan ji dema Imperatoriya Osmanî wek belge dihatin pejirandin. Li gor agahiyên hikûmeta Sûriyê hejmara kesên ku wek *ecnebî* hatibûn qeydkirin, di navbera 1966 û 1986ê de ji 84 000 daket 40 587, ku ta 1ê tebaxa 1985ê ji ber zewacan an zarokên ku ji wan re çêdibûn, hejmara wan bilind bû 54 218 kes û ta 31ê cotmeha 1995ê bû 67 465 kes.¹⁷

Li gor agahiyên çavdêran gelek kes nebûn, an jî piştî dana bertîlan bûn, xwedî nasname, tevî ku belgeyên wan ên munasib hebûn. Peywendiyên baş û bertîlên baş têr dikirin ku mirov dîsa nasnameya sûrî bi dest bixîne.¹⁸ Gelek rewş naskirî ne, ku tevî hin kesan belgeyên osmanî pêşkêş kirine, ku eşkere teqez dikin ku malbatên wan ji wê demê ve li ser xaka »sûrî« diman, lê dîsa jî nasnameyên wan li wan nehatin vegehandin. Herweha arşîvên ku qaxezên bacan ên ji bo vegehandina nasnameyê pêwîst tê de hatin veşartin, piştî demeke kurt hat dîsa hatin girtin. Bi vî awayî welatîyan nema dikarîbû wê wek belge bi kar bînin.¹⁹

Mirov qet nikare bêje ku lêkolînkirina stendina nasnameyan bê pêşhelwest bû. Dive serjimartina 1962ê

16 Biner li daxuyaniya balyozxaneyê li jor, li gor Human Rights Watch 1996: Appendix A.

17 Human Rights Watch 1996: Appendix A. Li vê derê neliheveke eşkere heye: Eger hejmara *ecnebiyan* di sala 1986ê de 40 587 bû, ew nikare di 1ê tebaxa 1985ê de bûbe 54 218.

18 McDowall 1998: 39.

19 Human Rights Watch 1996: 14–15.

wek yekemîn tedbîrên erebîkirinê bê fêmkirin, ku di salên 1960 û 1970ê de hatin pêkanîn.

Dîskrîmînekirina rojane – li ser rewşa niha ya Kurdên bê nasname

Bi fermana hikûmeta Sûriyê dezgehên medenî yên xên parêzgeha Hîsiçayê dawîya sala 2008ê kesên *ecnebî* jimartin. Encamên hejmartinê nehatin weşandin – lêbelê KurdWatch ji piraniya dezgehên nifûsê agahiyên li ser hejmara *ecnebiyan* bi dest xistin. Beşek ji wan hejmaran hinekî bi nêzîkî ne, beşek din hejmarên eslî ne. Li gor wan rewş bi vî awayî ye:

Çilaxa:	14 800
Tirbesipî:	7 651
Qamişlo:	12 500
Hîsiça:	20 000
Dêrik:	48 200
Amûdê:	28 000
Dirbêsî:	11 400
Serê Kaniyê:	10 000
Til Temir:	632
Til Koçer:	768
Til Hemîs:	385

Bi tevayî di sala 2008ê de 154 000 kesên *ecnebî* hebûn. Eger mirov van hejmaran û yên hikûmeta Sûriyê di 31ê cotmeha 1995ê de (67 465) bide ber hev, mirov dibîne ku di sêzdeh salên buhurî de hejmara kesên *ecnebî* bêtir ji du taqan zêde bûye. Şiroveya vê zêdebûna mezin hesan e: zarok û zarokên zarokên kesên *ecnebî* jî *ecnebî* ne.

Ji bilî *biyanîyên* qeydkirî li Sûriyê grûpeke din a Kurdên bêyê nasnameya Sûriyê heye: kesên *mektûm* (*ecnebiyên* neqeydkirî). Li gor agahiyên hikûmeta Sûriyê kesên *mektûm* ew in ên ku piştî serjimartina di sala 1962ê de bi qaçaxî derbasî parêzgeha Hîsiçayê bûne û xwe li wir bi cî kirine.²⁰ Li gor vê yekê dibe ku nasnameyek din a van kesan hebe – wek nasnameya tirkî yan iraqî – yan jî mafê wan hebe ku van nasnameyan bi dest bixin. Li gor vê teyoriyê ti peywendiya kesên *mektûm* bi serjimartina di sala 1962ê de tune. Di axavtina xwe ya di parlamentê de piştî hîlbijartina wî ji bo cara duyem di 17ê tîrmeha 2007ê de serok

20 Human Rights Watch 1996: 20.

Beşar el-Esed li ser mijara Kurdên bê nasname diyar kir, ku pirsgerêka serjimartina di sala 1962ê de û ya kesên *mektûm* du mijarên ji hev cuda ne.²¹

Mirov nikare zelal bike bê ma şiroveyên hikûmeta Sûriyê rast in an na – ji ber ku di şiroveyên derbarê koçberkirina kurdî ya qaçax berî 1962ê guman hene û çêtir e mirov hişyar be, çimkî di pirsê kesên *mektûm* de jî ti hewildan nehatiye kirin da wan vegeerînin Tirkî yan Iraqê. Tiştê teqez ew e ku zarokên kesên *mektûm* bi xwe jî *mektûm* in, û zarokên ji zewacên ku bav an dê *mektûm* be, statûya kê ji wan çî be jî, *mektûm* in. Tenê awarteyek heye: nasnameya bav hebe û dê *mektûm* be – di vê rewşê de zarok nasnameyê distîne. Herweha zarokên ji zewacên *ecnebiyên* (mêr) û jinên xwedî nasnameya sûrî *mektûm* in.²² Lê dîsa jî li ser çêbûna kesên *mektûm* kê hatîye gotin: Ne zêde gengaz e ku ev grûp, ku li gor agahiyên hikûmeta Sûriyê di sala 1985ê de ji 600 000 kesan pêk dihat, tenê ji zewacên *ecnebiyên* mêr bi jinên xwedî nasnameya sûrî çêbûne. Şiroveyeke gengaz ew e ku ew kes jî bûn *mektûm*, ku di serjimartina sala 1962ê de nehatibûn jimartin.²³ Ne dût e ku hejmara wan kesan mezin bû: Ne dût e ku tevî »reklama« ji bo serjimartinê hayê beşekî ji xelkên gundan jê çênebûbû û beşekî din encamên neqeydkirinê baş nedianîn ber çavan, dibe ku ji ber neqeydkirin di berjewendiya hinekan de dixuya, çimkî kesên neqeydkirî naçin leşkeriyê.

Çawa jî grûpa kesên *mektûm* di esl de çêbûbe jî, li gor temxînên hikûmeta Sûriyê hejmara wan di sala 1995ê de 75 000 bû.²⁴ Ev zêdebûn bi çêbûna zarokan dikare bê şirovekirin. Eger hejmara kesên *mektûm* di sêzdeh salên bi dû de mîna ya kesên *ecnebi* zêde bûbe, hingî ew di sala 2008ê de dora 160 000 bû. Eger mirov kesên *ecnebi* û yên *mektûm* li hev zêde bike, hejmara Kurdên bê nasname digihê 300 000î. Mirov ji vê yekê dikare bêje ku piraniyeke berbiçav a tevaya kesên *ecnebi* û *mektûm* piştî 1962î – ango piştî serjimartinê – li Sûriyê çêbûye.

Cedwelê jêrîn dîmenekê nîşan dide bê li jêr kîjan mercan zarokên li Sûriyê çêbûyî xwedî nasname, *ecnebi* yan *mektûm* in. Wek ku li jor hat eşkerekirin, ev yek bi statûya dê û bav ve girêdayî ye. Di cedwelê de herweha agahî hene bê di zewacên ku mêr an ji *ecnebi* yan

21 Biner li »'Aiy tarîh ba'd hall maudu' al-işşā' yu'tabar muhāwala li-hazzi istiqrār al-waṭan.< An-naşş al-kāmil li-kalimat ar-ra'īs Baššār al-'Asad fī maḡlis aš-ša'b ba'd 'adā' al-qasam ad-dustūrī«, 18ê tîrmeha 2007ê. Li jêr vê navnîşanê hat dîtin <http://www.amude.net/Nivisar_Munteda_deep.php?newsLanguage=Munteda&newsId=6181>.

22 Lê zarokên ji welatîyên xwedî nasnameya sûrî û ejnebiyên jin nasnameyê bi dest dixin – li vê derê qanûna Sûriyê dibêje ku esil statûya mêr e, ku rewşa zarokê pê ve girêdayî ye.

23 Hevpeyvîn bi sê parêzerên ji parêzgeha Hisiçayê re, çileyê paşîn ta adara 2010ê. Herweha Mitranê Dêra Sûrî-Katolîk piştgiriya vê teyoriyê dike. Hevpeyvîna bi Mitran re, Hisiça, 13ê nîsana 2008ê.

24 Human Rights Watch 1996: Appendix A.

mektûm be, ta çî radeyê derfet heye ev zewac fermî bê qeydkirin û bi vî awayî statûya zarokan baştir bibe.²⁵

Mêr	Jin	Qeydkirina zewacê	Rewşa zarokan
welatiyê bi nasname	welatiya bi nasname	erê	welatiyên bi nasname
<i>ecnebî</i>	<i>ecnebî</i>	erê	<i>ecnebî</i>
<i>mektûm</i>	<i>mektûm</i>	na	<i>mektûm</i>
welatiyê bi nasname	<i>ecnebî</i>	bi rûxseteke taybetî	welatiyên bi nasname
welatiyê bi nasname	<i>mektûm</i>	bi rûxseteke taybetî	welatiyên bi nasname
<i>ecnebî</i>	welatiya bi nasname	bi rûxseteke taybetî, jimara qeydê ya eslî ya jinê dimîne wek xwe û berdewam wek azib tê binavkirin	<i>mektûm</i> , piştî qeydkirina zewacê <i>ecnebî</i>
<i>ecnebî</i>	<i>mektûm</i>	na	<i>mektûm</i> , piştî qeydkirina di deftera malbatê ya bav de <i>ecnebî</i>
<i>mektûm</i>	welatiya bi nasname	na	<i>mektûm</i>
<i>mektûm</i>	<i>ecnebî</i>	na	<i>mektûm</i>

Ev cedwel pêşî tişteki eşkere dike: Ta roja îro qanûna sûrî li ser kesên *ecnebî* û *mektûm* nayê pêkanîn. Ku zarok *ecnebî* yan *mektûm* çêdibin, bendê 3ê tîpa cê ya Qanûna Nasnameya Sûrî binpê dike. Di vê qanûnê de hatiye nivîsandin, ku ew kes welatiyê sûrî yê ereb e,

»yê ku di dewletê de [Sûrî] wek zaroka dê û bavine nenaskirî yan jî xwediyê nasnameyên nenaskirî yan bê nasname çêbûbe. Zarokek ku di dewletê de hati-be dîtin, wek ku di dewletê de û li ciyê ku lê hatibe dîtin, çêbûyî tê hesibandin, eger belgeyeke berevajî neyê pêşkêşkirin.«

Li gor vî bendî gerek nasnameyên sûrî bên dan ji bo zarokên li Sûriyê çêbûyî yên kesên *ecnebî* û *mektûm*. Lê ev yek pêk nayê.

Lê li vir bêtir ew hale balkêş in ku ji bo qeydkirina zewacê yan baştirkirina statûya zarokan erêkirinê taybetî pêwîst in. Hala pêşî li ser zewaca welatiyên mêrên bi nasname bi jinên *ecnebî* re ye. Ew mecbûr in pêşî zewaca xwe ji aliyê Dadgeha Şerîayê ve teqez bikin. Dive êdî biryara dadgehê ligel belgeyek ji qeydan her yekî ji wan (*xirac qeyd*) bên pêşkêşkirin ji bo nifûsê.

25 Agahjiyên ku li vê derê li ser rewşa qanûnî ya kesên *ecnebî* û *mektûm* tên pêşkêşkirin, piştî lêkolînine berfireh ji aliyê nivîsaran ve hatine peyda kirin û ew herweha ji aliyê hersê parêzerên li jor behskirî ve hatin piştrastkirin.

Ew ji aliyê xwe ve belgeyan dişîne ji Dezgeha Karûbarên Medenî li Hisiçayê û ji wir belge tên şandin ji Dezgeha Giştî a Karûbarên Medenî re.²⁶ Êdî belge ji vir tên şandin Şamê ji Dezgeha Ewlekariya Siyasî û Dezgeha Ewlekariya Dewletê re, ku ji aliyê dezgehên xwe yên li Hisiçayê ve li bajarên xwediyên dozê lêkolînan pêk tînin. Eger herdu dezgehên ewlekariyê ji bo qeydkirina zewacê erêkirinên xwe dabin, Dezgeha Giştî a Karûbarên Medenî erêkirinekê amade dike, ku di rêya Hisiçayê re tê şandin ji nifûsa peywendîdar re. Nifûs zewacê qeyd dike û deftereke malbatê derdixîne. Jin di qeyda (*xaneya*) xwe ya eslî de dimîne û zarok dikevin qeyda bavê xwe.

Hala duyem li ser zewaca welatîyên mêr ên bi nasname bi jinên *mektûm* re ye. Karûbarên qeydkirina zewaceke wilo mîna ya zewacên welatîyên mêr ên bi nasname bi jinên *ecnebî* re ye – tenê cudabûnek heye, ew jî ew e ku jinên neqeydkirî mecbûr in ne xirac qeydên xwe, lêbelê şehadeyên naskirinê ji cem muxtar pêşkêş bikin. Jin di deftera malbatê ya zilam de tê qeydkirin, lê qeyda wê bi xwe çênabe.

Zarokên ji zewacên welatîyên mêr ên bi nasname û jinên *ecnebî/mektûm* yekser dibin welatîyên bi nasname – eger muxtarê peywendîdar ji zarokan re belgeyê çêbûnê derxistibe û zewaca dê û bav hatibe qeydkirin.

Hala awarte ya din li ser mêrên *ecnebî* ye, ku bi jinên xwedî nasname re dizewicin. Eger ew bixwazin zewaca wan bê qeydkirin, Dive jin li cem Dadgeha Şerîayê li dijî mêrê xwe gilî bike.²⁷ Di gilî de »teqezkirina zewacê«
tê xwestin û eger zarok ji herduyan re çêbûbin, hingî »teqezkirina zewacê û pejirandina bavbûnê ji bo zarokan«
tê xwestin. Bi amadebûna şahidan dadwer zewacê û/yan bavbûna zarokan dipejirîne. Kopiyek ji biryarê tê şandin ji nifûsa peywendîdar re. Eger ji zewacê zarok çêbûbin, dive ew, dê û bavên wan û herweha du şahid biçin cem polîsan û biryara dadgehê û belgeyên çêbûna zarokan, ku ji aliyê muxtar ve tên derxistin, bi xwe re bibin. Dive şahid piştrast bikin ku ew zarok bi rastî jî zarokên xwediyên doznameyê ne. Êdî raportek tê amadekirin, ku ligel belgeyên din dîsa tê şandin ji nifûsê re. Zarokên ku temenê wan bêtirî şazdeh salan in, dive bi xwe li wir amade bibin. Nifûs tebaya dosyayê dişîne ji Dezgeha Karûbarên Medenî re ya li Hisiçayê. Ew ji wir

26 Dezgehên behskirî girêdayî Wezareta Hundir in.

27 Li gor agahiyên çavkaniyê-ke din mêr jî dikare gilî bike.

tê şandin Şamê ji Dezgeha Giştî ya Karûbarên Medenî re, ku wan ji aliyê xwe ve dişîne ji Dezgeha Ewlekariya Siyasî re. Dezgeha Ewlekariya Siyasî jî ji dezgeha xwe ya li Hisiçayê dixwaze ku belgeyan kontrol bike – ku ev jî ji aliyê xwe ve ji dezgeha xwe ya li bajarê xwediyên doznameyê dixwaze ku bi vî karî rabe. Dema encam amade dibe, dîsa di heman rêya fermî re tê vegerandin. Eger bersiv erênî be, nifûsa peywendîdar piştî çend mehan pejirandina qeydkirina zewacê yan jî ya zewacê ligel a zarokên ji vê zewacê distîne. Zewac tê qeydkirin û deftereke malbatê taybetî ji bo kesên *ecnebî* tê radestkirin xwediyên meseleyê. Zarok mîna bavê xwe *ecnebî* ne û di xaneya wî de tên qeydkirin. Jin di deftera malbatê te tê qeydkirin, lê dimîne di xaneya xwe de.²⁸

Hala din li ser zewaca welatîyên mêr *ecnebî* bi jinên *mektûm* re ye. Qeydkirina vê zewacê li cem Dadgeha Şerîayê gengaz e. Lê ev yek ji bo qeydkirina zewacê li cem nifûsê têrê nake. Lê zarokên ji zewacên wilo dikarin di xaneya bavê xwe de bîn qeydkirin. Ji bo vê yekê dive mirov biryara Dadgeha Şerîayê pêşkêşî nifûsê bike. Zarokên ku ji roja çêbûna xwe ve *mektûm* in, êdî dibin *ecnebî*. Ji ber ku zewaca dê û bav nayê qeydkirin, ew di xaneyên xwe de azib dimînin. Jin nakeve deftera malbatê ya mêrê xwe.

Li Sûriyê kesên *ecnebî* û yên *mektûm* jî rastî gelek sînorkirinan tên. Ji ber ku ew ne welatîyên sûrî yên xwedî nasname ne, ew ne dikarin beşdarî hîlbijartinan bibin, ne jî bîn hîlbijartin. Ne nasnameyên wan ên şexsî hene, ne jî pasport. Wek nasname kesên *ecnebî* ji nifûsê xirac qeydekê ji qeydên biyaniyan distînin. Çûna derveyî Sûriyê bi vê belgeyê ne gengaz e. Eger kesên *ecnebî* bixwazin derkevin derve, ew dikarin doza pasportekê bikin. Dive dozname ligel xirac qeydekê û sê wêneyên şexsî bîn şandin Şamê ji Wezareta Hundir (Dezgeha Koçberiyê û Pasportan) re. Dosya ji bo lêkolînkirinê tê şandin ji Dezgeha Ewlekariya Siyasî re. Eger Dezgeha Ewlekariya Siyasî doznameyê bipejirîne, pasport dikare bê derxistin. Pasport tenê ji bo du salan e û mirov dikare tenê carekê pê derkeve û dîsa vege-re. Ji bo dirêjkirina pasportê û derketineke din doznameyên din pêwîst in.

Kesên *mektûm* tenê şehadeyeke naskirinê ji muxtarê peywendîdar distînin. Ji bo derxistina vê şehadeyê mux-

28 Li gor çavkaniyeke din zewacên di navbera mêrên *ecnebî* û jinên xwedî nasname tenê hingî tên qeydkirin, eger ji vê zewacê zarok çêbûbin. Wilo diyar e ku agahiyên cuda yên çavkaniyên me vedigerin biryarên cuda û ne sabit ên dezgehên peywendîdar.

tarê li bajarê xwediyê meseleyê berpirsyar e. Berî derxistina vê belgeyê dive Dezgeha Ewlekariya Siyasî derxistina wê bipejirîne – rêya fermî li Hisiçayê bi dawî tê. Lê dibe ku li vir pirsgirêk derkevin: Mersûmê jimar 7889-J, ku parêzgerê Hisiçayê di 15ê cotmeha 1999ê de biryara wê da, li muxtar û dezgehên lokal de derxistina belgeyên ji bo kesên *mektûm* qedexe dike.²⁹ Tevî ku ne her muxtarekî ev mersûm bi cî anî, wî ji beşekî ji muxtaran re di derxistina şehadeyên naskirinê de pirsgirêkine baş çêkir an jî bû sedem ku dive muxtar van belgeyan li derveyê bajarên xwe derxînin.

Ji kesên *ecnebî* û *mektûm* re qedexe ye ku bibin xwedî zevî û avahiyan an jî bibin xwediyên dikanan û wan bifiroşin – an ku ew nikarin van tiştan fermî li ser navên xwe qeyd bikin. Ne ji mafê wan e ku bibin karmendên dewletê yan jî mîras jê re bimîne yan mîrasê ji kesekî re bihêle. Herweha ne ji mafên wan e ku temwîna ku dewlet erzan dide welatiyan, bi dest bixin û ew nikarin trimbêlekê yan jî makîneyên din li ser navên xwe qeyd bikin. Berevajî kesên *mektûm*, kesên *ecnebî* dikarin nasnameya ajotinê ya şexsî derxînin, lê ne ya ji bo taksî yan jî ji bo otobûsan.

Eger kesên *ecnebî* yan *mektûm* ji parêzgeha Hisiçayê derkevin, ew tenê hingî dikarin di hotêlekê de rakevin, eger wan ji cem Nivîsgeha Hotêlan a Dezgeha Ewlekariya Dewletê ji bo vê yekê destûr standibe.

Ji bo şandina zarokan ji bo dibistanê pêwîstiya kesên *mektûm* herweha bi şehadeyên naskirinê yên taybetî ji bo çûna dibistanê heye. Ew bi heman şeweyê derxistina şehadeyên naskirinê yên normal tên derxistin. Piştî bidestxistina vê belgeyê kesên *mektûm* dikarin ta bakaloryayê biçin dibistanê. Ew dikarin beşdarî ezmûna dawîya pola 9ê (dawîya pêvajoya navîn) û herweha ezmûnên bakaloryayê bibin. Lê ew ne şehadeya dawîya xwendinê, ne jî ti şehadeyên din nastînin, li dibistanan hatiye qedexekirin ku belgeyên mohra dibistanê li ser bidin kesên *mektûm*.³⁰ Eger kesên *mektûm* doznameyekê pêşkêşî Dezgeha Perwerdeyê li Hisiçayê bikin, ew dikarin dawîya pola 9ê yan 12ê belgeyên li ser xwendina di wan salan de bi dest bixin.

Xwendina zanîngehê ji kesên *mektûm* re qedexe ye. Lê kesên *ecnebî* dikarin tevaya madeyan bixwînin, lê ne tevaya pîşeyan pêk bînin. Wek mînak kesên *ecnebî* ni-

29 Montgomery 2005: 80; Savelsberg & Hajo 2004: 17 (Fn. 60); HRAS 2003: 8; ev agahî di 27ê tebaxa 2005ê de ji aliyê parêzerekî li Qamişloyê ve hatiye teqezkirin. Li gor agahiyan parêzerekî ji Qamişloyê, ku di sala 2009ê de ji komek muxtaran li Qamişloyê pirsarê meseleyê kiribû, hingî ev mersûm nehatibû radestkirin muxtaran, lê tenê bi devkî ji wan re behsa naveroka wê hatibû kirin.

30 Biner li Biryareke îdarî jimar 4724/4623 a Wezareta Perwerdeyê, Dezgeha Perwerdeyê li Hisiçayê, di 17ê îlona 2008ê de. Deqa eslî ya vê biryarê ligel wergera wê dikare di malpera <www.kurdwatch.org> de di beşê »Belge« de bê xwendin.

karin bibin parêzer, çimkî şertê pêkanîna vê pîşeyê ew e ku mirov bi kêmanî berî pênc salan nasnameya sûrî bi dest xistibe – welatîyên filestînî mîna welatîyên sûrî yên xwedî nasname tên hesibandin. Karê pijîşkiyê dikare piştî erêkirineke rotînî ji aliyê Wezaretê Tenduristiyê ve bê kirin, lêbelê tenê di iyade yan nexweşxaneyên taybetî de, ne di dezgehên dewletê de. Ji bo kesên *ecnebi* endametiya di sendîkayên parêzer, pijîşk, dermanzan û endezyaran de kesê bi vî awayî ye: ew nikarin bibin endamên sendîkaya parêzeran; endametiya temamî di sendîkaya pijîşkan de ne gengaz e, lê ev du sal in ku ew dikarin bibin endamê Sebeta Hevbeş a sendîkayê. Ev sebet ji bo endaman dabînkirinê civakî û tenduristî misoger dike. Ji bo kesên *ecnebi* endametiya ji ya welatîyên xwedî nasname bûhatir e. Sendîkaya Endezyaran li Hîsiçayê kesên *ecnebi* dipejirîne.

Berevajî îdiayên ku gelek çaran tên kirin, kesên *mektûm* û *ecnebi* di nexweşxaneyên dewletê de tên dermankirin.

Bi giştî mirov dikare bêje ku kesên *ecnebi* û bi taybetî yên *mektûm* di warê mafên wan ên siyasî, mafên qeydkirina tiştan ser navên xwe û herweha mafê perwerde û hîlbijartina pîşeyê rastî sînorkirinê berbiçav tên. Bi ser de jî karûbarên îdarî yên biçûk mîna qeydkirina zewaca Kurdên bê nasname astengên aloz çêdikin. Bi taybetî derbaskirina Dezgeha Ewlekariyê ya Siyasî nav komek ji karûbarên îdarî dibe sedema tevliheviyê li cem kesên peywendîdar û tirsaxerabbikaranîna bi xwe re tîne – bi taybetî di şeweyên tirsandin û bertîlan de.

Siyaseta Beşar el-Esed li hemberî kesên bê nasname

Li jêr desthilatdariya Beşar el-Esed siyaseta li hemberî kesên *ecnebi* û *mektûm* zêde di xalên bingehîn de nehatiy guhertin – em behsa wê yekê nakin, ku pirsaxerabbikaranîna bê nasname çend çaran eşkere hatiye guftûgokirin. Tê gotin ku di dawîya 2002ê de, bi helkefta Şerê Iraqê yê li ber deriyên, di nav hikûmet yan jî parlamenta Sûriyê de li ser dana nasnameyan ji bo Kurdên bê nasname gengeşe pêk hatine. Tê gotin ku Beşar el-Esed bi xwe di serdana xwe ya ji bo Hîsiçayê de di havîna 2002ê de soz daye kesayîtiyên kurd ku ji bo pirsaxerabbikaranîna ku ji serjimartina 1962ê

derketine, çareseriyekê peyda bike. El-Esed di axavtina xwe sûndxwarinê de di 17ê tîrmeha 2007ê de behsa van danûstandinan kir û diyar kir ku ji ber rewşa siyasî ya giştî di vî warî de ta niha ti pêşketin çênebûne:

»Berê, gelek welatîyên sûrî tiştê li ser meseleya serjimartina sala 1962ê nizanîbû; wan nizanîbû bê ka naveroka vê meseleyê û tiştên ku dihatin behskirin, çi ne. Min di tebaxa sala 2002ê de serdana parêzgeha Hisiçayê kir û min hevdîtin bi hemî beşên civakê re pêk anîn, bi hemîyan re. Hemûyan behsa vê meseleyê kir. Min ji wan re got: Ti pirsgirêk tune, emê dest pê bikin. Ji xwe em di wê demê de di destpêka pêvajoya amadekirinên Emerîkayê ji bo dagîrkirina Iraqê de bûn. Em hingî di Encumena Ewlekarîyê [ya Neteweyên Yekbûyî] de bûn. Hingî ev mijar ne zêde lezgîn bû. Temenê vê meselê çil sal bûn. Me hêdî pê re dida û distend, lê em li ciyê xwe nedisekinîn. Û êdî Şerê Iraqê hat û pê re jî rewşên cuda, ku herweha gelek pirsên di jî dan rawestandî, mîna reformên hundirî. Ta ku em gihan sala 2004ê û bûyerên xerabkirinê li parêzgeha Qamişloyê pêk hatin. Û me hingî baş nizanîbû bê ka çi li dû van bûyeran bû. Çimkî hinekan hewil dida ku van bûyeran ji bo armancine neniştimanî bi kar bînin. Lê piştê eşkere bû ku ev bûyerên xerabkirinê bûn û ti têkiliya wan bi tiştê neniştimanî re tune bû, tevî ku hinekan hewil dida ku wê bi kar bînin. Tevî vê yekê jî mesele hat rawestandî, da ku bi şeweyekî zelal dubare lêkolîn li ser bê kirin, li ser xelfiyeta van bûyeran. Û par, bi inîtsyatîva dewletê me ev mesele careke din xist rojevê. Me ew vejand, çimkî ew bûyer derbas bûn.«³¹

Bi rastî jî di sala 2006ê de pirsgirêka kesên bê nasname û dana nasnameyan ji bo beşekî ji Kurdên bê nasname carek din hatin gengeşekirin, bi taybetî berî kongra Partiya Bees di hizêrana 2005ê de.³² Di nîsana 2005ê de li bajarên Serê Kaniyê, Til Temir û Amûdê karmendên dezgeha nifûsê û herweha endamên hêzên ewlekarîyê komek pirs ji kesên *ecnebî* kirin.³³ Wilo diyar e ku ev mijar di kongrê Partiya Bees de jî hatiye guftûgokirin – ev yek ji hevpeyvîneke serokwezîr Nacî el-Utrî bi rojnameyekê re diyar dibe. Ew li wir dibêje:

31 Biner li »'Aiy tarh ba'd hall mauđu' al-işşā' yu'tabar muhāwala li-hazzi istiqrār al-waṭan.« An-naşş al-kāmil li-kalimat ar-ra'is Başşār al-'Asad fî mağlis aş-ša'b ba'd 'adā' al-qasam ad-dustūrī«, 18ê tîrmeha 2007ê. Li jêr vê navnîşanê hat dîtîn: <http://www.amude.net/Nivisar_Munteda_deep.php?newsLanguage=Munteda&newsId=6181>.

32 Vê gengeşeyê ciyê xwe di çapemeniyê jî de dît, wek mînak biner li »After decades as nonpersons, Syrian Kurds may soon be recognized«, *New York Times*, 28ê nîsana 2005ê; »Syria's stateless Kurds hope for new rights«, *Reuters*, 13ê gulana 2005ê; »Al-Assad meets Kurdish tribe reps; Syrian nationality offered to 100,000 Kurds?«, *Arabic News*, 16ê gulana 2005ê; »Kurdish unrest over citizenship promise«, *AKI*, 17ê gulana 2005ê.

33 »After decades as nonpersons, Syrian Kurds may soon be recognized«, *New York Times*, 28ê nîsana 2005ê. Çavkaniyên me li herêmê ji me re teqez kir ku bi rastî jî rapirsîn pêk hatin. Lê mezinbûna van rapirsînan ne zelal e. Çavkaniyeke din diyar kir ku hikûmetê di destpêka 2005ê de doza tevaya qeydên biyaniyan kiriye.

»Li cem pirsgirêka serjimartina 1962ê heye. Yek ji biryarên ku ji dehemîn kongrê giştî yê partiyê derketin, ew e ku em mijara serjmartinê dîsa bixin rojevê. Ev yek wê mafê bide xistinê nasnameyê bide komêk ji welatîyên sûrî yên bi esil kurd, ku demên berê de li Sûriyê çêbûne, ku ev yek xwezteka wan a bingehîn e. [...] Ji bo me mijara serjmartinê giring e. Hejmara kesên peywendîdar di navbera 80 000 û 90 000î de ye. Beşek mezin ji wan koçberî bakurê Iraqê bûye.«³⁴

Di destpêkê de ti encamên biryarên kongra Partiya Bees tunebûn. Tenê di axavtina xwe sîndaxwarinê ya li jor behskirî de di tîrmeha 2007ê de Beşar el-Esed dîsa behsa çarseriyeke nêzîk ji pirsgirêkê re kir. Ew li ser qanûnekê rawestiya, ku pêşamadekirina wê ya teknîkî hema bêje bi dawî hatiye, û bi alîkariya wê gerek pirsgirêka kesên bê nasname bê çareserkerin. Wî got ku tevlihevkerina mijarên cuda, ango girêdana kêşeya kesên *ecnebî* ji aliyekî ve bi ya kesên *mektûm* re ji aliyekî din ve, bûye asteng li pêşiya derxistina vê qanûnê. Wî di axavtina xwe de got:

»Şaşfêmkirinek di navbera du mijaran de heye: babeta serjimartina sala 1962ê, ku hingî nasnameya sûrî giha beşekî ji malbatên hin kesan û beşê dî nasname nestend, ku bi xwe ji mafê wan e.

Mijareke din heye, ku navê kesên *mektûm* lê hatiye kirin. Hin kes hebûn ku di wê baweriyê de bûn ku di wê demê de ew kes [ên *mektûm*] beşek ji pirsgirêkê bûn. Kesên *mektûm* kesine ji Sûriyê ne, ku nasnameyên wan ên cuda hene, lê ti qeydên wan li Sûriyê tune, ne di qeydên sîvîl li Sûriyê de, ne jî li deverêke din. An ku ev meseleyeke din e. Hin kes hebûn ku mijara kesên *mektûm* bi ya serjimartina 1962ê tevlihev dikir. Herweha hin kes ji nasnameyên cuda hatine Sûriyê, piraniya wan ji Kurdan bûn ku ji Tirkîyan Iraqê ji ber sedemên jiyanê, sedemine siyasî, ewlekariyê yan sedemine din hatine. Îşê me bi vê babetê tune.³⁵ Em behsa meseleya serjmartinê dikin. Di pêvajoyên dawî de hema bêje karê teknîkî yê ji bo qanûnekê bi dawî hat. ... Em li kû sekinîn? ... Me got em dixwazin, lê em rê nadin bikaranînê. Em dixwazin hemî aliyên ku giringiyê didin vê babetê,

34 Biner li »Ra'îs mağlis al-wuzarâ' as-sûrî Nâğî 'Utrî: Laisa hunâka 'azma li'l-'akrâd wa iħşâ' 1962 yasmaħ bi-manħ 90 'alf kurdî al-ğinsîya faqať wa mağmu'a min al-'ahzâb il-kurdîya madfu'a min al-ħârîğ« [hevpeyvîn bi mit *el-Enbaa*, 20ê tîrmeha 2005ê]. Li jêr vê navnîşanê hat dîtin: <http://www.amude.net/Hevpeyvîn_Munteda_deep.php?newsLanguage=Munteda&newsId=3235>.

35 Ne zelal e bê serok li vê derê behsa kîjan grûpa Kurdan dike.

bizanibin, ku mesele tenê ya serjimartina 1962ê ye. Em naxwazin ku em ji doza serjimartina 1962ê herin wê yekê ku piştî çil salan hin kes bîn ji me re bêjin ku pirsgerêkeke din heye; pirsgerêkek ku navê wê serjimartina 2007ê ye, yan jî ku hin kes hebin ku nasname nestendine. Ez van gotinan dibêjim, ji ber hin kes hene vê mijarê li cem dezgehên li Ewropayê yan jî li cem şandên ku em wan dibînin û ligel me li ser vê babetê diaxivin, bi kar tînin. Baş eşkere ye ku hin kes hene ku vê meseleyê bi kar tînin. Em dixwazin ku qanûn derkeve, piştî ku me li hev kiribe ku ev qanûn çareserîya niştimanî ya dawî ye. Û ti meseleyeke din piştî çareserkirina babeta serjmartinê tê wateya hejandina seqamgîriya niştimanî. Babet niha ev e. Guftûgo hîn berdewam in. Dema em vê meseleyê bi dawî bînin, hingî qanûn amade ye. Û ev meseleyeke hesan e. Û ez bawer im ku li Sûriyê li ser pêwîstiya çareserkirina vê pirsgerêkê lihevhatineke niştimanî heye. Min dixwezt ez ji we re zelal bikim bê em çawa li ser vê babetê difikirin.«³⁶

El-Esed li vir ji aliyekî ve eşkere dike ku guhertina rewşa kesên *mektûm* ne di rojevê de ye.³⁷ Ew dibêje ku mirov tenê hingî dikare çareseriyekê ji pirsgerêka kesên *ecnebî* re peyda bike, eger di hundirê Sûriyê de êdî kesek doza çareseriyekê ji bo pirsê kesên *mektûm* jî neke – bangeke eşkere ji bo partiyên kurdî. Di heman demê de ji bo pirsgerêka kesên *ecnebî* ti asyoyên siyasî nayên pejirandin. Mîna di hukûmetên berê de, vê carê jî tenê tê pejirandin ku di çarçeweya serjmartinê de hin şaşitî çêbûne, ku dive bîn çareserkin. El-Esed dibêje ku ev şaşitî tenê teknîkî ne. Şiroveyên wilo li deverine din jî peyda dibin, wek di hevpeyvîneke serokê dewletê bi kanala tirkî *Sky News* re di çileyê pêşîna de. Li vê derê tevaya »Pirsê Kurdî« tê daxistin ji bo pirsgerêkeke teknîkî ku girêdayî serjmartinê ye:

»Ji bo me li Sûriyê pirsgerêka kurdî pirsgerêkeke teknîkî ye, ku bi serjimartina di sala 1962ê de têkildar e, çimkî ew di warê teknîkî de ne serestî bû. Lê hingî ti pirsgerêkeke siyasî tunebû. Û eger beramberî mijara kurdî kêşeyeke siyasî hebûya, wê serjmartin yekcar pêk nehatiba. Ji ber vê yekê em li Sûriyê vê kêşeyê

36 Biner li »>'Aiy tarh ba'd hall mauđu' al-iħşā' yu'tabar muħāwala li-hazzi istiqrār al-waṭan.« An-naşş al-kāmil li-kalimat ar-ra'is Başşār al-'Asad fī mağlis aš-ša'b ba'd 'adā' al-qasam ad-dustūr«, 18ê tîrmeha 2007ê. Li jêr vê navnîşanê hat dîtin: <http://www.amude.net/Nivisar_Munteda_deep.php?newsLanguage=Munteda&newsId=6181>.

37 Bi heman awayî serokwezîr Nacî el-Utrî di hevpeyvîna xwe ya berê behskirî de ligel rojnameya kiwêtî *el-Enbaa* di tîrmeha 2005ê de axivîbû. Wî di wir de gotibû: »Emê bi Kurdên mayî [mebest li vir kesên *mektûm* in] re, yên ku ji Tirkî û Iraqê hatine, wilo bidin û bistînin, wek ku mirov li seranserî dinyayê bi rewşa kesên ku tîn cem wan re dide û distîne. Ew ne sûrî ne, lêbelê ew ji welatine cîran hatine û derbasî Sûriyê bûne. Komêk ji partiyên dilîzin û tevliheviyan gur dikin, wek ku li bakurê Sûriyê çêbû [mebesta wî bûyerên adarê di 2004ê de ye].«

bi şêweyekî teknîkî çareser bikin, çimkî ti astengên siyasî li dijî vê yekê tunene. Hertîştê ku em pê difikirin, ew e ku ev mijar girêdayî ye bi bingeha niştimanî û dîroka Suriyê ve, ku ji dema serxwebûnê nehatiye guhertin û wê di pêşerojê de jî neyê guhertin.»³⁸

Hevpeyvîneke bi Mitranê sûrî-katolîk ê Hisiçayê Jacques Behnan Hindo re eşkere dike ku berevajî gotinên serok dîsadana nasnameyan ji bo kesên *ecnebî* ne tenê ji aliyê kesên dilxwazên wê ve, lebelê bi taybetî ji aliyê dijberên wê ve siyasî tê dîtin. Wî diyar kir, ku serokê dewletê berdewam bi wî û herweha mitranên dêrên mesîhî yên din re li ser Pirsê Kurdî dişêwîre. Wî got ku ew tevde li dijî dîsadana nasnameyan ji bo Kurdên bê nasname ne – li gor bîrûboçûnên wî pêncî ji sedî ji gelê kurd li bakurê-rojhilatî Sûriyê bê nasname ne. Ji aliyekî ve, çimkî li gor wî Kurdên ku di sala 1962ê de nasname ji wan hat standin, an welatîyên tirkî yan iraqî ne. Ji aliyekî din ve, çimkî li gor wî dana nasnameyan ji bo vê koma kesên wê balansa neteweyî di navbera welatîyên kurd û ereb de ji bo Ereban xerab be. Û ji aliyekî siyem, çimkî li gor wî gelê kurd beramberî dewleta Sûriyê ne wefadar in. Li gor bîrûboçûnên wî baştirîn çareserîya kêşeyê ew e ku tevaya Kurdên bê nasname li bakurê Iraqê, ku di destê Kurdan de ye, bîrûboçûnê bicîkin.³⁹ Hevpeyvîn eşkere dike, ku komên civakî yên xwedî bandor hene ku eşkere li dijî veqerandina nasnameyan ji bo Kurdên bê nasname ne – mîna di 1962ê de bêtir ji ber sedemine siyasî yan îdyolojî: balansa neteweyî li herêmê û xwedêgiravî newefaderiya gelê kurd.

Eger mirov li rewşa siyasî ya li jor eşkerekirî binere, mirov dibîne ku zehmet e çareseriyek ji bo pirsgerêka kesên bê nasname peyda bibe. Ji bo Beşar el-Esed dana nasnameyan ji bo beşekî (mezin) ji kesên *ecnebî* ta radeyekê gengaz e – bi şertê ku piştî gengeşî li ser kesên *mektûm* an jî bi giştî gengeşî li ser rewşa Kurdên li Sûriyê bi dawî bîr. Ku nûnerên partiyên kurdî wê vê lihevhatinê bipejirînin, ne gengaz e – û ew nikarin misoger jî bikin ku Kurdên serbixwe yan çalakvanên siyasî li derve lihevhatineke wilo bipejirînin. Serok vî tiştî dizane. Di heman demê de dixuye ku ne tenê di nav komên civakî yên bi bandor de (mîna dêrên mesîhî), lêbelê di nav hikûmetê yan dezgehên dewletê

38 Biner li »Başşâr al-'Asad: Al-muškila al-kurdîya hiya muškila tiqnîya lahâ 'alâqa bi-l-'iḥşâ' wa hiya laisat muškila siyâsiya!«, 28ê çileyê pêşîna 2005ê. Li jêr vê navnîşanê hat dîtin: <http://www.amude.net/Hevpeyvîn_Munteda_deep.php?newsLanguage=Munteda&newsId=4210>.

39 Hevpeyvîn bi Mitran Jacques Behnan Hindo re, Hisiça, 13ê nîsana 2008ê.

de jî kesên xwedî bandor li dijî dana nasnameyan ji bo kesên *ecnebî* yan dana ti mafan ji bo Kurdan hene. Mirov dikare bi vî awayî şirove bike ku ta adara 2010ê ti qanûn – an hewildaneke çareserkerinê – ji bo rakirina kêşeya kesên *ecnebî* peyda nabe. Ev rewş wilo ye, ji ber rastiyeke e ku ji sala 2005ê ve li Sûriyê ti bûyerên kurdî yên berbiçav pên nehatine û serokê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê Barack Obama ji hilbijartina wî wek serok di sala 2009ê de bi taybetî hewil dide ku Sûrî dîsa vegeerîne nav civata dewletan. Mirov nema dikare qin-yatê bi kesî re çeke ku bûyerên siyasî li derveyî welêt ji bo rawestandina prosesa guhertinan bike hicet.

Çavkanî

Barût, Cemal, tebaxa 2009ê: »Kaifa naşa'at muşkilat ›'ağānib Turkiyā' fi Sūriya?«, *Le Monde diplomatique éditions arabes*. Li jêr vê navnîşanê hat dîtin: <<http://kassioun.org/index.php?mode=article&id=3394>>.

Human Rights Association in Syria (HRAS), çiriya paşîna 2003ê: *The effect of denial of nationality on Syrian Kurds*. Şam. Li jêr vê navnîşanê hat dîtin: <<http://hras-sy.org/english/reports.htm>>.

Human Rights Watch (berhev.), cotmeha 1996ê: *Syria. The silenced Kurds*. Li jêr vê navnîşanê hat dîtin: <<http://www.hrw.org/en/reports/1996/10/01/syria-silenced-kurds>>.

McDowall, David 1996: *A modern history of the Kurds*. London: I. B. Tauris.

McDowall, David 1998: *The Kurds of Syria*. London: Kurdish Human Rights Project.

Montgomery, Harriet 2005: *The Kurds of Syria. An existence denied*. Berlin: Europäisches Zentrum für Kurdische Studien.

Perthes, Volker 1990: *Staat und Gesellschaft in Syrien 1970–1989*. Hamburg: Deutsches Orient-Institut.

Savelsberg, Eva & Siamend Hajo 2004: *Die Situation staatenloser Kurden in Syrien*. Li jêr vê navnîşanê hat dîtin: <<http://www.fluechtlingsrat-nrw.de/1868/>>.